

Ji bo
şagirdê klasa 9ê li dibistana bingehî
yan klasa 10ê li dibistana taybetî

Îmtîhanên giştî (yên neteweyî)

Silav!

Ev name ji te re hatiye ji ber ku tu dê di vê salê xwendinê de îmtîhanên giştî yên zimanê swêdî û swêdî wek zimanê duyê, îngilîzî, matematîk û bîyolojî, fîzîk yan kîmyayê û cografîya, tarîx, dîn yan zanyariyên civakî bikî.

Armanca îmtîhanên giştî ew e ku di nîrxandina zanîna te de alîkariya mamostayên te bê kirin. Plankirina kursan yê madeyên cuda dibe bingeh gava biryar li ser naverok û hazîrkirina îmtîhanan tê dan. Netîceya te ya îmtîhana giştî dibe qismek ji nîrxandina civandî ya ku dibe sebeb ku tu çî qas mimkin be dereceyê dawîyê ya adil bistînî.

Daîreya Giştî ya Dibistanan wezîfeyê dide çend zanîngehên welatî ku îmtîhanan hazîr û amade bikin. Pirsên îmtîhanan li gelek dibistanên cuda li seranserî welatî hatine ceribandin. Heqê şagird û mamostayan hebû ku dîtinên xwe bidin û ew li ber çav hatine wergirtin gava îmtîhan hatiye hazîr kirin.

Mamostayên te yê madeyên cuda dê agahdariyan derbarê tarîxên îmtîhanan, nîrxandin û tiştên din yê girêdayê îmtîhanan bidin te.

Zimanê swêdî û swêdî wek zimanê duyê

Îmtîhana giştî ya zimanê swêdî û swêdî wek zimanê duyê ji sê qisman pêk tê.

Qismê A îmtîhaneka devkî ye ku pê nîrxandina te li ser sê qisman tê kirin: pêşkêşkirina mijarekê, birêvebirina nîqaşekê û beşdarîkirin di nîqaşekê de. Teksteka kurt, wêneyek yan parçefilmek ji te re dibe bingehê ji bo pêşkêşkirin û sihbeta li dû wê. *Di qismê B* de, tu dê qabiliyeta xwe ya xwendina tekstên cuda nîşan bidî. Di roja îmtîhanê de, tu dê defterikeka tekstan û teqriben 30 prîsiyaran derbarê teksta wê defterikê werbigirî. Pêşîyê tu dê xwendina defterika tekstan dest pê bikî û paşî prîsiyaran werbigirî. *Qismê C* qabiliyeta te ya nivîsîna mijarekê di madeyeka diyarkirî de diceribîne. Sê mijar pêşkêşî te tên kirin da ku tu yekê ji wan hilbijêrî.

Îngilîzî

Di îmtîhana giştî ya zimanê îngilîzî de, tu dê qabiliyeta xwe nîşan bidî ku tu dikarî îngilîzîyê di axaftin û nivîsînê de bi kar bînin tu wê îngilîzîyê ya ku tu dibihîzî û dixwînî fehm dikî.

Qismê A îmtîhaneka devkî ye ku tu dê pê qabiliyeta xwe ya sihbetkirin û axaftinê nîşan bidî. Di *qismê B* de, tu dê berî her tiştî qabiliyeta xwe ya xwendin û fehmkirinê û ya guhdarîkirin û fehmkirinê nîşan bidî. *Qismê C* îmtîhaneka nivîskî ye ku tu dê pê qabiliyeta xwe ya nivîsandina teksteka bihevegirêdayî ya îngilîzî nîşan bidî.

Matematik

Îmtîhana giştî ya matematîkê ji çar qisman pêk tê. *Qismê A* qabiliyeta te ya şopandin û bi devkî pêşkêşkirina hizirkirina matematîkê diceribîne. Îmkan ji te re tê dan jî ku tu îzah û delîlên şagirdên din biceribînî.

Qismê B ji wan pirsiyaran pêk tê yên ku divê bê alavên dijîtal û cedwel bîn bersiv dan. Divê tu ji bo hin pirsiyaran bersivên xwe wesif bikî û ji bo pirsiyarên din tenê bersivan bidî. *Qismê C* ji pirsiyareka berfirehtir ya lêkolînxwaz pêk tê ku divê tu bersiva xwe wesif bikî. *Qismê D* ji çend pirsiyaran pêk tê ku divê tu bersivên xwe wesif bikî. Piraniya caran pirsiyar li ser mijarekê ne.

Biyolojî, fîzya yan kîmya

Hemû şagirdên dibistana te îmtîhana giştî ya heman madeyê dikan. Tu teqrîben sê hefteyan berî dema îmtîhanê dê bizanî ka kîjan îmtîhan dê bê kirin.

Di *qismê A1* de, ku qimsê îmtîhanê yê teorî/nezerî ye, divê tu zanîna xwe bi kar bînî da hevbendiyên zanistî û îlmî wesif bikî û îzah bikî. Di *qismê A2* de, divê tu zanîna biyolojî, fîzya yan kîmyayê bi kar bînî da bi hûrî li agahdarîyan binêrî, bidî û bistînî û dîtina xwe li ser pirsên saxlemî, enerjî, teknîk, jîngeh, bikaranîna siruştê û parêzîya jîngehî û ekolojîk diyar bikî. Di *qismê A3* de, divê tu lêkolînekê plan bikî. Di *qismê B* de, ku îmtîhana ceribandî û mixteberê ye, divê tu lêkolînekê pêk bînî û encaman ji netîceya wê derxînî.

Cografiya, dîrok, zanyariyên dînî yan zanyariyên civakî

Hemû şagirdên dibistana te îmtîhana giştî ya heman madeyê dikan. Tu teqrîben sê hefteyan berî dema îmtîhanê dê bizanî ka kîjan îmtîhan dê bê kirin.

Hem *qismê A* û *qismê B* nivîskî ne û bi awayên cuda qabiliyetên ku di planên kursên cuda de hene diceribîne.

Agahdarîyên zêdetir li kûderê hene?

Agahdarîyên zêdetir li ser madeyên îmtîhanên giştî di malpera Daîreya dibistanan [Skolverketê] de hene

www.skolverket.se/bedomning

Li wê derê link ji bo minakên hin pirsiyarên îmtîhanan hene.

Peywendiyê bi Daîreya dibistanan bike

nationellaprov@skolverket.se